Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :456 nameronahi@gmail.com 28- îlon - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Ruhê Broyê Heskê Têlî li Çiyayê Agiriyê ye





Cewdet Çokdîl, behsa kalê xwe Broyê Heskê Têlî ku yek ji pêşengên Serhildana Agiriyê bû kir. Çokdîl got: "Hîn jî ruhê Broyê Heskê Têlî li Çiyayê Agiriyê ye. Broyê Heskê Têlî çirûskek bû. Ew çirûsk bû agir."
Yek ji pêşêngên Serhildana Agiriyê jî Broyê Heskê Têlî ye. Cevdet Çokdîl yê 70 salî, behsa kalê xwe Broyê Heskê Têlî kir.

### DIBE PÊŞENGÊ SERÎHILDANÊ

Çokdîl, bilêv kir ku ew bi çîrokên Broyê Heskê Têlî mezin bûne. Çokdîl, diyar kir ku li Bazîdê dikana pirt û pertalan a kalê wî û birayên kalê wî Ehmed û Eyup hebûye. Çokdîl behsa tevlîbûna kalê xwe ya serîhildanê kir û got: "Dema hikûmetê qanûna 1926'an pêk anî, cendirme gund bi gund geriyan û kesên navê wan di lîsteyê de digirtin. Dema Broyê Heskê Têlî dibihîse mufrezeyeke leşker ber bi gund ve tê, tevdîrê xwe digire. Li hêla Pira Belek ew û cendirmeyan şer dikin û di wî şerî de du leşker birîndar dibin. Ji ber vê leşker paş ve vedikişin. Piştî vê Broyê Heskê Têlî berê xwe dide Çiyayê Agiriyê û dibe yek ji pêşengên Serîhildana Agiriyê. Her wiha ev xwîn dibe sedema serîhildanê jî."

### TESLÎMIYET LI CEM WÎ TUNE BÛYE

Çokdîl, anî ziman ku Broyê Heskê Têlî heta sala 1930'yî jî di nav şer de dimîne. Çokdîl, diyar kir ku wê wextê Tirkiye û Îran gelek caran ji kalê wî re dibên teslîm bibe, lê belê kalê wî qet qebûl nekiriye. Çokdîl, bilêv kir ku di dema serhildanê de Broyê Heskê Têlî tahhde li kesî nekiriye û çav bernedaye mal û milkê kesî û got: "Broyê Heskê Têlî ne kesekî xwende bû, lê xwedî wijdan û merd bû. Wêrek bû. Teslîmiyet li cem wî tune bû."

### RUHÊ WÎ NIHA LI ÇIYAYÊ AGIRIYÊ YE

Çokdîl wiha dewam kir: "Niha ruhê Broyê Heskê Têlî li Çiyayê Agiriyê ye. Broyê Heskê Têlî çirûskek bû. Ew çirûsk bû agir." Çokdîl behsa demên dawî yên Broyê Heskê Têlî û serhildanê jî kir û got: "Li Derbaseya Zeryanê ya Çiyayê Agiriyê şerekî mezin qewimî. Li vê derbaseyê gelek evraz hene. Şevekê kalê min û yekîneya wî di wir re derbas dibin û dixwazin çepera artêşê bişikînin. Leşkerên ku hay ji wan çêdibin direşînin ser wan û pevçûn dest pê dike. Di dema pevçûnê de bi sedan kurd di evrazê wer dibin û dimirin. Lê Broyê Heskê Têlî û yekîneya wî şer dikin û paş ve vedikişin. Şervan û mabatên wan di navbera Çiyayê Agirî yê biçûk mezin de asê dimînin. Ferzende Axa û 10 şervan çeperê dişikînin û hin sivîl û şervanan derbasî hêla Îranê dikin. Pevçûn heta nîvê şevê dewam dikin. Di vê pevçûnê de du birayên Broyê Heskê Têlî jî dimirin. Sivîlên sînor derbas dikin jî teslîmî Îranê dibin. Broyê Heskê Têlî ku li nêzî sînorê Îranê li herêma Kirê bi guleya milîsên Eşîra Şikakiyan tê kuştin."
Çokdîl, diyar kir ku piştî serhildanê di 5'ê Gulana 1932'yan de qanûneke nû ya sirgûnê tê çêkirin û malbata Broyê Heskê Têlî sirgûnî Denîzliyê tê kirin. Çokdîl got: "Em 15 salan li Denizliyê man. Ez li Denizliyê çêbûm. Li Denîzliyê em wek êsîran bûn. Ji ber malbata me nexwende bû û bi tirkî nizanibû, gelê herêmê û rayedarên dewletê heqaret lê dikir. Mal û hin erd dabûn me. Me çandinî dikir. Jiyana me ya rojane dewam dikir. Her çend her tişt xweşbûna jî, lê em sirgûnkirî bûn. Em li Denîzliyê tim bi hesreta welat bûn. sirgûn jî li êş û azara me zêde bibû. Em bi hesreta warê xwe bûn. Dema Partiya Demokratê bû hikûmet, Menderes efûyek derxist. Paşê em jî vegeriyan warê xwe. Ji wê rojê ve qet hizra ku em ji vî warê ku Broyê Heskê Têlî gav bi gav lê geriyaye dûr bikevin."

### GORA WÎ TUNE YE

Çokdîl, diyar kir ku wan bi salan li gora Broyê Heskê Têlî û hevalên wî geriyaye, lê belê wan nedîtiye...*MA*

# Jiyana kampê jin bi rêxistin dikin



Koçberên di kampa Eyn Îsa de dimînin bi gelek zehmetî û pirsgirêkan re rû bi rû dimînin. Bi Taybet zêdetir di şertên koçberiyê de û di nava kampan de zehmetiyan dikişînin. Lê tevî hemû zehmetiyan jî jin xebatên xwe birêvedibin û li kampê pêşengiyê ji jiyanê re dikin.
Di kampa Eyn Îsa ya girêdayî kantona Girê Spî ya herêma Firatê de nêzî 13 hezar koçber dijîn. Di nava wan de nêzî 4 hezar û 250 jin hene. Liv û tevgera jinan ya di nava kampê de bi awayekî şênber tê dîtin. Jin jiyana di nava kampê de birêxistin dikin û bi rêve dibin.
Jin pirsgirêkên ku dertên pêşiya wan jî bi derfetên xwe yên heyî çareser dikin. Ji bo ku jiyan li kampê berdewam bike û astengî dernekevin jin bi roleke sereke radibin...*ANHA*



Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 456 28- îlon- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Li Efrînê 2 dagirker hatin kuştin



Şervanên YPG'ê li Efrînê çalakiyên xwe yên li dijî leşker û çeteyan berdewam dikin. Şervanên YPG'ê di van çalakiyan de derbên giran li dagikeran didin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya YPG'ê ragihand ku di çalakiyên li navçeya Reco ya Efrîn û navenda Efrînê de 2 dagirker hatine kuştin.*R-2*

# DMME ÊŞKENCEYA LI ÎMRALIYÊ REWA DIKE

**Dewleta Tirk ev 20 sale derveyî hemû qanûn û pîvanên navnetewî li Imraliyê li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tecrîdeke giran pêk tîne. Tevî ku dewleta Tirk bi awayekî eşkere li Îmraliyê qanûn û hiqûqê binbê dike lê saziyên weke CPT û DMME helwestê nagirin, bi erka xwe ranabin û di çarçoveya fermanên siyasî de tevdigerin.**



## DMME DIBE HEVKARÊ TECRÎDÊ

Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê DMME,bi salane di mijara tecrîda li Îmraliyê ya li dijî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de siyasî tevdigere û dibe hevkarê sûcên dewleta Tirk. DMME a serlêdana Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan nirxand û ragihand têkildarî êşkenceya li ser Ocalan delîlên têrker tune ne. DMME biryar da ku divê giliyê êşkencekirinê were redkirin. Di biryarê de tê diyarkirin ku maf û azadiyên Ocalan jî nehatine binpêkirin. *R-5*

## BIRYARA DMME LI DIJÎ KURDAN E


Hevseroka Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) û her wiha Endama Şandeya Imraliyê Pervîn Buldan, ji bo ku Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) serlêdana êşkence ya 2008'an a li Imraliyê ya li ser Ocalan red kir helwest nîşan da. Bûldan got, "Li ser rêzdar Ocalan ev 20 sal in tecrîdeke giran heye. Divê ev biryar ne tenê li dijî Rêzdar Ocalan divê helwesta li dijî hemû Kurdan were fêhmkirin. DMME bi vê biryarê piştgiriyê dide tecrîdê." *R-4*

## Jinên Reqayê dagirkerîya Tirk şermezar kirin



Meclisa Jinên Reqa û Gundewarên Wê bi daxuyaniyekê dagirkerî û kiryarên dewleta Tirk li dijî gelê Sûriyê şermezar kirin. Daxuyaniya ku li navenda Meclisa Jinên Sûriyê hat dayîn de hat gotin ku dewleta Tirk dixwaze dagirkeriya xwe li Sûriyê berfireh bike û dan zanîn ku ew piştgiriya berxwedana gelê Efrînê dikin. *R-3*

## Li dijî Erdogan dakevîn qadan




Federasyona Karkerên Koçber ên Elmanya li dijî serdana Serokkomarê Tirk Recep Erdogan a 28-29'ê Îlonê ya Elmayayê banga xwepêşandanên protestoyî li gel kir. Federasyonê da xuyakirin ku hevkariya navbera dewletan encex bi hêza galan tê hilweşandin û got: "28-29'ê Îlonê wê bibe wesîleya peyman û îtîfaqên qirêj ên nû." *R-2*

## Gerîla li dijî artêşa Tirk çalakî pêk anîn



Li bakurê Kurdistanê çalakiyên gêrîlayên HPG'ê li dijî artêşa Tirk berdewam dikin. Gerîla di van çalakiyan de derbên bi bandor li artêşa Tirk didin. Navenda Ragihandinê ya HPG'ê diyar kir ku hêzên wan li Eyaleta Serhedê li dijî leşkerên tirk çalakiyeke sekvaniyê pêk anîne û di encamê de leşkerek hatiye kuştin. *R-2*

## Mam Zekî li Şengalê bi merasîmekê hat bîranîn



Di 15'ê Tebaxa 2018'ê de balafirên şer ên dewleta Tirk êrîşê Şengalê kirin. Di êrîşê de Endamê Koordînasyona Civaka Êzidî Mam Zekî Şengalî şehîd bû. Bi boneya 40 rojiya şehîdbûna Mam Zekî li Serdeşt a Çiyayê Şengalê merasîmek bîranînê hate lidarxistin. Di merasîmê de behsa rola Zekî Şengalî ya ri rêxistinkirina civaka Êzidî de hat kirin û hat gotin ku divê Êzidî li hember êrîşan yekîtiya xwe ava bikin. *R-2*

## Ol xistin bin xizmeta desthilatiyê

Hevberdevka Kongreya Îslama Demokratîk KÎD'ê Huda Kaya îslama desthilatdariyê nirxand û diyar kir bi sedsalane ol xistine bi xizmeta desthilatdariyê û li dijî gelan tê bikaranîn. Huda wiha got, "Divê qirkirina Kerbelayê baş bê tahlîlkirin û bûyera Kerbelayê tiştên îro tên jiyîn, nîşan dide." *R-3*



## Erdogan û El Qaîde li hev rûniştin, çete vedikişin

Hate ragihandin rejîma Erdogan û HTŞ ya girêdayî El Qaîdê li hev rûniştine. Hate îdîakirin komên çete yên girêdayî dewleta Tirk wê ji herêma tampon ku Tirkye û Rûsyayê sînorê wê danîne vekişin. Berpirsekî çete ku navê xwe nedaye got, "Rewş baş dibe û Tehrîr El Şam, bêyî ku ji raya giştî re ragihîne got ew ê li gor peymanê tevbigere." *R-5*



## Partiyan li ser xebatên hevbeş lihevkirin



Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê Şahoz Hesen diyar kir ku ew bi armanca nirxandina pêşketinên li herêmê, Sûriyê û Kurdistanê bi partiyên siyasî yên Kurd ên Rojava re civiyane. Hesen destnîşan kir ku hemû partî di civînên ku hatibûn lidarxistin de li ser girîngiya berdewamkirina xebata siyasî ya hevbeş li hev kirine. *R-4*

## Divê Kurd yekîtiya netewî ava bikin



Parlementerê Partiya Demokratîk a Gelan HDP'ê yê Amedê Îmam Taşçier bal kişand ser yekîtiya netewî ya kurdan û diyar kir ku di vê merheleyê de yekîtî ji bo kurdan bivê nevê ye. Taşçier wiha got, "Eger li Kurdistana ku bûye çar perçe yekîtî pêk neyê, ne mimkun e ku di têkoşîna azadiyê de jî bi ser bikevin." *R-4*

# Li Efrînê 2 dagirker hatin kuştin

**Şervanên YPG'ê li Efrînê çalakiyên xwe yên li dijî leşker û çeteyan berdewam dikin. Şervanên YPG'ê di van çalakiyan de derbên giran li dagikeran didin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya YPG'ê ragihand ku di çalakiyên li navçeya Reco ya Efrîn û navenda Efrînê de 2 dagirker hatine kuştin.**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya YPG'ê ragihand ku di çalakiyên 25-26'ê Îlonê yên li navçeya Reco ya Efrîn û navenda Efrînê de çeteyekî Ehrar Şerqiye û leşkerekî artêşa Tirk hatiye kuştin.
YPG'ê ragihand ku di çalaiya sekvanî ya 25'ê Îlonê ya li navenda Efrînê de leşkerekî artêşa Tirk a dagirker ê bi navê Alî Okar hatiye kuştin û di çalaiya 26'ê Îlonê ya li gundê Goliya ya navçeya Reco ya Efrînê de jî çeteyê bi ser koma Ehrar Şerqiye hatiye kuştin û çeka wî hatiye desteserkirin.
Navenda YPG'ê destnîşan kir ku di çarçoveya pêngava duyemîn ya Berxwedana Serdemê de hêzên wan li navenda bajarê Efrînê û navçeya Raco li dijî artêşa Tirk a dagirker û komên çete yên girêdayî wê çalakiyên bi bandor didomînin. Di vê çarçoveyê de:
"Di roja 25'ê Îlonê de yekîneyek me li navenda bajarê Efrînê li hember leşkerên artêşa Tirk a dagirker çalakiyeke sûîkastê pêk anîn. Di encama çalakiyê de leşkerê Tirk yê bi navê Alî Okar hate kuştin.
Di roja 26'ê Îlonê de yekîneyek me li dijî çeteyên koma bi navê Ehrar Şerqiye, li ser rêya gundê Goliya ya navçeya Raco çalakiyek pêk anîn. Di encama çalakiyê de çeteyek hate kuştin û çeka wî hate desteserkirin."

Navenda Ragihandina *Yekîneyên Parastina Gel (YPG)*



## Gerîla li dijî artêşa Tirk çalakî pêk anîn

Navenda Ragihandinê ya HPG'ê diyar kir ku li Şirnex û Wanê di çalakiyên gerîla de yên li dijî artêşa Tirk leşkerên kuştî û birîndar hene. HPG'ê derbarê êrîşên hewayî yên li ser Qadên Parastinê yên Medyayê agahî da.
Daxuyaniya ku Navenda Ragihandinê ya HPG'ê dayî wiha ye:
''Li Eyaleta Serhedê bi çarçoweya Pêngava Şoreşger a Serfiraziyê' hêzên me 26'ê îlonê saet 15.10'an li Çaldêrranê ya Wanê, li dijî artêşa TC'ê ya dagirker ku ewlehiya Qereqola Kevirê Şamiyan digirtin rêze çalakiyeke sekvaniyê pêk anîne. Di encama çalakiyan de 1 leşker hatiye kuştin, 1 jê birîndar bûye.
Hêzên me bi çarçoweya Pêngava Şehîd Delal Amed û Şehîdên Besayê Pêngava Şoreşger dane destpêkirin. Li Silopya ya Şirnexê li dijî Santrala Termîkê ya Bêspînê çalakiyeke saboatajê kirine. Di encamê de xeta elektrîkê bi temamî îmha bûye.
25'ê Îlonê sibehê artêşa TC'ê ya dagirker li Şemzînanê ya Colemêrgê operasyonek wê qadê kiriye ku gundê Tûyê, Warê Sêva û Omeryan vedihewîne navxwe. Artêşa TC'ê ya dagirker ku li eraziyê xebatên lêgerînê dikriin 26'ê Îlonê bê encam vekişiyane.

## Li dijî Erdogan dakevîn qadan




Federasyona Karkerên Koçber ên Elmanya (AGÎF) li dijî serdana Serokkomarê Tirk Recep Tayyîp Erdogan a 28-29'ê Îlonê ya Elmayayê banga xwepêşandanên protestoyî li gel kir.
AGÎF da xuyakirin ku hevkariya navbera dewletan encex bi piştgiriya bi hêz a galan tê hilweşandin û got: "28-29'ê Îlonê wê bibe wesîleya peyman û îtîfaqên qirêj ên nû ku ji bo her cûre azadî û demokrasiyê tine bike ye. Ev peyman wê ne tenê ziyanê bide gelên Tirkiye, Kurdistan û Rojhilata Navîn her wiha wê bide hemû gelan."
Federasyona Karkerên Koçber ên Elmanya ji bo mîtîna ku wê 28'ê Îlonê li Postdamar Platz saet 16:00'an li Berlîn, 29'ê Îlonê jî mîtînga navendî ya li Deûtzer Werft saet 10:00'an li Kolnê bê kirin bang li hemû endam, alî û gelan kir ku bi hêz tevlî bibin.


## Mam Zekî li Şengalê bi merasîmekê hat bîranîn



Li Serdeşta Çiyayê Şengalê Mam Zekî bi merasîmekê hate bibîranîn. Di merasîmê de li ser navê partî û rêxistinên Şengalê, Rojava, Başûr û oldarên Êzidî axaftin hatin kirin.
Di 15'ê Tebaxa 2018'ê de balafirên şer ên dewleta Tirk êrîşê Şengalê kirin. Di êrîşê de Endamê Koordînasyona Civaka Êzidî Mam Zekî Şengalî şehîd bû. Bi boneya 40 rojiya şehîdbûna Mam Zekî li Serdeşt Çiyayê Şengalê merasîmek bîranînê hate lidarxistin.
Di merasîmê de li ser navê oldarên civaka Êzidî Mam Fexir Xelef axivî. Xelef diyar kir ku ew Mamê Civaka Êzidî Zekî Şengalî bi rêzdarî bibîr tîne, sersaxî ji civaka Êzidî û tevahî gelê Kurd re dixwaze.
Hevserokê Meclisa Xweseriya Şengalê Hisên Hesen jî di merasîmê de axivî û got; "Şehadeta Mam Zekî Şengalî ji bo civaka Êzidî pir giran bû. Em ti carî mamê xwe ji bîr nakin. Bila civaka Êzidî hemû bizanibe em ji ferman û xiyanetê xelas nebûne. Pêwîste em gelê Êzidî yekîtiya xwe xurt bikin. Dijmin fikirî bi şehateda Mam Zekî Şengalî karibe civaka Êzidî ji holê rabike. Lê emê vê derfetê nedin dijmin ku karibe planên xwe pêk bîne."
Hevserokê Tevgera Azadiya Civaka Kurdistanê Mihemed Ebdullah jî axivî û got; "Zekî Şengalî bi têkoşîna xwe gelê Êzidî piştî 74 fermanan rakir ser lingan. Gelê Êzidî li ser vî esasî wê şopdarê rêya wî bin. Wê kes nekaribe carek din gelê Êzidî tine bike. Êzidî di vê demê de xwe bi xwe parastina xwe dikin. Xwe bi rêve dibin. Bila dijmin baş bizanibe kes nikare weke demên berê civaka me qetil û tine bike."
Di dewama merasîmê de li ser navê Komîteya Malbatên Şehîdên PKK'ê li Başûrê Kurdistanê, Tevgera Azadiya Jinên Êzidî (TAJÊ), YBŞ û YJŞ, Saziya Malbatên Şehîdên Şengalê, komîteya amadekar a merasîmê peyam hatin xwendin. Sersaxî ji bo tevahî gelê Êzidî hate xwestin.

## Li Nîjeryayê 200 kes ji ber lehiyê mirin

Li Nîjeryayê ji ber barana zêde ya li 12 eyaletan ku bû sedem lêhî rabe, bi kêmanî 200 kes mirin.
Saziya Rewşa Lezgîn a Netewî ya Nîjerya (NEMA) ragihand ku ji ber barana zêde ya li 12 eyaletên lêhî rabû. Li gorî bîlançoya NEMA dayî nêzî 200 kes mirine.
Barana zêde bû sedem ku çemê Nîjer û Banûe rabe û gund û bejahî di bin avê de bimîne.
Bi deh hezaran welatî li malên xwe asê mane, gelek kesên li herêmên mane di bin avê de dest bi revê kirine.
Berî vê bi deh rojan li eyaletên Kogî, Delta, Anambra û Nîjerya rewşa karesata netewî hatibû îlankirin. Kogî û Nîjer li navenda welat cih digir, Delga û Anambra jî li başûr cih digir.
Sekreterê Xaça Sor a Nîjerya Abûbekir Kende jî anî ziman û piştî xaresata lêhiyê metirsiya kolerayê anî ziman, li gorî Neteweyên Yekbûyiyê li bakurê rojhilatê welat ji ber nexweşiya kolerayê di du hefteyên dawî de nêzî 100 kes mirine.





# Ji bo Efrînê çalakiyên hunerî

**Çalakiyên ji bo rizgarkirina Efrînê berdewam dikin. Tevgera Çand û Hunerê bi durûşmeya, "Ji bo rizgarkirina Efrînê bi prensîbên netewa demokratîk têkoşiyan" li Kampa Berxwedan dest bi çalakiyên hunerî kirin. Wê ev çalakî li hemû navçeyên Şehbayê bên birêxistin kirin.**

Çalakiyên roja yekem a kampanyaya hunerî ku bi dirûşemaya "Ji bo rizgarkirina Efrînê bi piransîbên netewa demokratîk têkoşiyan" li Kampa Berxwedan têne organîzekirin, dest pê kirin.
Kampanya bi armanca piştgiriya Pêngava Rizgarkirina Efrînê ji aliyê Tevgera Çand û Hunerê ve hat birêxistin kirin.
Kampanya bi meşekê li Kampa Berxwedan hate ragihandin û bi çalakiyên hunerî dest pê kir.
Di çalakiyê de, nûnerên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk, şênî rêveberên kampa Berxwedan û Endamên Tevgera Çand û Hunerê amade bûn.



Rêveberê Tevgera Çand û Hunerê ya Efrînê Niyazî Seydo axivî û got: "Artêşa Tirk a dagirkeer bi armanca qirkirina çandî û nasnameya gelê Efrînê êrîşî Efrînê kirin."
Seydo got, "gelê Efrînê li hemberî teknîka şer a dagirkeran 58 rojan li ber xwe da û berxwedana xwe niha li kampan didomîne."
Piştî axaftina Nîyazî Seydo koma dilanên Kurdî yên girêdayî Tevgera Çand û Hunerê tabloyên dîlanan pêşkêş kirin.
Koma Rojava ya stranan û koma Afrînerên hêviyê ya şanoyê û koma Berxwedan a stranan berhemên xwe pêşkêş kirin.
Çalakî, bi gerandina xelekên dîlanan li ber stranan bi dawî bû.
Wê çalakî li navçeyên Şehbayê bên birêxistin kirin…*ANHA*

## Pirtûka Şoreşa Rojava' bi Farîsî hat çapkirin

Jinên Nivîskar ên ku tevlî Pêşengeha Pirtûkan a li Dêrikê bûn diyarkirin ku ji bo hînbûna rastiya dîrokê û jinê xwendina pirtûkan girîng e û gotin: "Jin rûyê wêjeyê yê germ e. Loma divê bi taybet jin li wêjeyê xwedî derkevin."
Jinên Nivîskar ên ku tevlî Pêşengeha Pirtûkan a li Dêrikê bûn anîn ziman ku ji bo civakek pêşketî divê her dem pêşengehên pirtûkan bên lidarxistin û gel teşwîqî xwendinê bê kirin.
Endama Desteya Çandê a Bajarê Dêrikê Dicle Muhemed got: "Ji bo gel dîroka xwe û rastiyên xwe hîn bibin û teşwîqî xwendinê bên kirin pêşengehên bi vî rengî girîng in. Pêşengeha pirtûkan dîroka me bi me dide naskirin. Heta em nexwînin û em li wêjeya xwe xwedî dernekevin wê neyarên me li ser keda me rûnin û berhemên me bidizin. Loma divê hemû gel bixwînin û girîngiyê bidin xebat û çalakiyên wêjeyî. Wêjeya gelekî eynika wî gelî ye. Divê em dev ji rastiya xwe û ji wêjeya xwe bernedin û xwedî lê derkevin."
Nivîskara bi navê Şemis Enter jî wiha nêrînên xwe anî ziman: "Ji ber ku sîstemên heta niha hatine li ser keda jinê rûniştine her dem jin ji wêjeyê dûr xistin. Lê




dema ku em lêdikolin em dibînin ku gelek jinên hêja ku di warê wêjeyê de xwedî berhemên bi qîmet in, hene. Lê kes qala wan nake. Ji ber ku her dem keda wan hatiye binaxkirin. Armanca me yek jê ew e ku jin di qada wêjeyê de çalaktir bin. Dema em dinêrin jin xwedî dîrokek kevnar in. Jinê her dem li dijî kapîtalizmê li berxwe daye. Jin rûyê wêjeyê yê germ e. Loma divê bi taybet jin li wêjeyê xwedî derkevin."…*JINNEWS*

## Bexçeyê zarokan veguherandin navenda parastina çandê



Baxçeyê Zarokan ê Suryanî yê bajarê Hesekê veguherî navendeke ji bo parastina çand û hunera gelê Suryan.
Baxçeyê zarokan ku li Hesekê ji bo zarokên Suryanan hate vekirin. Di fêrkirin, şarezakirin û pêşxistina karînên zarokan de roleke girîng dilîze. Rêveberiya baxçe ku ji aliyê Yekitiya Jinên Suryan ve hatiye damezirandin, ji bo pêşeroja civaka xwe jî hewl dide zarokan fêrî rêgezên xwendin û nivîsandinê bike.
Baxçe di sala 2015`an de hate vekirin. 4 mamoste li baxçe dixebitin. 2 ji wan çalakiyên vehesînê amade dikin û alîkariya zarokan dikin. Mamosteya din rêgezên bingehîn, alfabeya suryanî û çend peyvên biyanî fêrî zarokan dike. Mamosteya çaremîn jî zimanê Suryanî fêrî zarokan dike.
Baxçeyê zarokan hemû zarokên pêkhateyan heta 5 saliyê pêşwazî dike. Hejmara zarokan di baxçe de 45 e.Têkildarî mijarê mamosteya bi navê Rîma Suryanî destnîşan kir ku baxçe di parastina çanda pêkhateya Suryan de roleke girîng dilîze. Rîma destnîşan kir ku piraniya waneyên ku li baxçe tên dayîn, waneyên vehesînê ne û di hefteyê de 3 wane ji zimanê Suryanî re hatine diyarkirin.Di dawiyê de Mamoset Rîma diyar kir ku armanca vekirina baxçe, fêrkirina rêgezên bingehîn ên jiyanê û xwendin û nivîsandinê ye…*ANHA*

## Dibistana ku baregeha DAIŞ'ê bû, ji nûve tê vekirin

Beriya 8 salan dibistana gundê Mihêsin a ku bûbû baregehek perwerdekirina çeteyan û depokirina çekên wan ji nû ve vedi be.
Komîteya Perwerde û Fêrkirinê ya Kantona Girê Spî dibistana Mihêsin a ku komên çekdar ji xwe re kiribûn baregeh û 8 salan xwendekar ji xwendinê qut kiribûn, piştî bi dawîkirina xebatên restorekirinê ji nûve vekir.
Têkildarî mijarê mamoste Rakan Memdûh diyar kir ku komên çekdar 400 şagirt, 8 salan ji xwendinê bê par hiştin. Niha xwendekar mezin bûne lê xwendin û nivîsandinê nizanin.
Rakan spasiya Komîteya Perwerde û Fêrkirinê ji bo vekirina dibistanê kir. Rakan destnîşan kir ku hejmara zarokan baş e û morala wan bilind e.
Mamoste Rakan bang li Komîteya Perwerde û Fêrkirinê kir ku hemû nivîsên ku komên çekdar li ser dîwarên dibistanê nivîsandibûn rakin…*ANHA*





## Ma stranên me ji dilê gel re dibin hêvî?

Hozan Seyîdxan

Qada mûzîk û stranê ji hestên kurde wariyê re îfade ya herî bihêze û di qada cand û hunerê de ciyekî girîng digire. Eger stran di çarçoveya ziman,naverok,muzîk,bikaranîna enstrumentan li gorî pîvan û forma deng bê amadekirin,hingê ew stran dikare bibe sedema rakirina raperînê.Ji civakêre dibe berhemik bi wate.
Tê zanin ku di vê qadê de stran û muzîkên ku ji destpêka tekoşînê de ku taniha hatine çêkirin , hetanî îroj li ser zar û zimanê civakê zindî mane.Di zimanê dilê gelde hêvî jînkirine.Ango berhemên bi bandor ku qed nayêne jibîrkirin hatine afirandin.
Dikarim bi bêjim di pêvajoyên tekoşîna şoreşê de gelek stranên şoreşgerî,surudeyan û stranên dengbêjiyê liser civakê û takeyên civakê bandorik mezin çêkirine.
Îro Eniya şoreşê ji doh pirtir mezin û ferehtir bûye,derfet ji afirandina stranê re ji doh pirtir û baştir çêbûne.Mixabin, rixmî va pêşketinan demik dirêje di qada muzîk û stranê de xitmandin,xwe dubarekirin,texlît kirin û kopîkirinek bê ser û ber dinava aloziyêde dice.Ji ber ku liser bingeha avakirina stranê û muzîkê lêhurbunek nujen nayê çêkirin,strana nujen ya bi hêz jî dernakeve.
Êdin rewşik neyinî ru daye ku (Her kes buye ziman zanek,helbestvanik, stranbêj,her kes bûye Hozan.) Ev tevlîheviyeke bê ser û bine.Bi gotinekdinê raste dinav civaka mede deng xweş pirin.Lê nayê zanîn ka sedema deng xweşiya kurdan ji ku tê.Ev rewş encex pîsikolog an jî sosyolog dikarin nav lê bikin.
Helbet na yê înkarê,divê qadê de hin xebatên baş û berhemên baş derketine.Di ber cêkirin û afirandina stranê de ked jî tê dayîn.Lê ji wan berhemê ku hatine çêkirin,naveroka stranê ne diyare,zimanê wê şikestiye,ji rêzikên bê wate hatine hunandin.Başe ciqasî ji hest û zimanê dilê gelre,ji jiyana şoreşgerî re bûne bersiv?Gelo ew stran çuqasî tên famkirin, çuqasî dilê civakêde cî digire, çuqasî mirovan şaa dike, çuqasî bi mirovan re hizkirin û sewdaya azadiyê peyda dike, çuqasî bi zimanik resen,hevokên bi wate û zelal şehîdan, şoreşê,raperîn û serhildanan,şervan û gêrîllayan di stranê de tînine ziman? Ev xala bi xwe jî hêjaye bê nirxandin.
Hemû kes dizane,stran mîna ava zelale,ji ber ku xîtabî hest û dilan dike,huneriye. Ji ber ku zimanê stranê têr û tuje ye mirovan şaa dike,didê giryandin,radike serihildanê,radike govendê.ango stran civakbûyîn bixwe ye.
Lê mixabe îro stranên têne çêkirin,ango derketine ji rastiya hunerê durin.Di bingeha va lawazî û pirsgirêkande rola hunermendan pir mezine.Eger hunermend xwe ji rastiya ramanê,bîrdozîyê dur bixe di encama afirandin û hilberîna wî de stranek bi bandor,tekstik fesîh bi hêz,qilîbek zelal û xurt jî wê neyê afirandin.
Li jor me qala destkeftiyan kiribû. çi li welat û derveyî welat bidehan dezgeyên çandê û hunerê hatine sazkirin.Ji bo hunera stranê û stranbêjî pêş bikeve,ji bo ku berhemên bi qalîte bêne afirandin,pêwiste kesê bi stranêre û stranbêjiyêre têkildare û dixwazin karê hunerê bikin berê xwe bidine wan dezgeyan,derfetê perwerdeyiyê,xwe jinuh de avakirinê li wire.Riya stran û mûzîka nûjen di ronakbiriyê re derbas dibe.Bi va hêvî û daxwazan çav li rê ye ku hunermendên kurd,wê bi afirandina berhemên nuh û xurt ji civakêre û ji şoreşê re bibin bersiv.û nav û dengên wan ji gel û dîrokê re bimîne. Em jî bi stran û berhemên wan şa bibin.

# Eşîran pirsgirêkên civakî nîqaş kirin

**Li Şedadê Koordînatorê di navbera Eşîr û Rêveberiya Xweser Abidîn Bedirxan bi eşîra El Cibûr ya Hesekê re civîya. Di civînê de bi dehan şêxên eşîran û rêveberên partiyana amade bûn. Di cîvînê de rewşa xizmetguzarî hat nîqaş kirin û hat xwestin ku Rêveberiya Xweser di vê mijarê de pirgirêkên ku hene çareser bike.**



Koordînatorê di navbera êlan û Rêveberiya Xweser Abidîn Bedirxan bi êla El-Cibûr a kantona Hesekê re civiya û pirsgirêkên wan hatin nîqaşkirin.
Civîn li gundê Hinêya rojava ya navçeya Şedadê bi amadbûna bi dehan şêxên eşîran û rêveberên partiyan pêk hat.
Di civînê de, rewşa jiyanî, pirsigêrkên xizmetguzariyê hatin nîqaşkirin.
Şêx Mihemed El-Rawî bi xêrhatina beşdaran kir. Paşê Şêx Newaf El-Dexîl li ser armanca lidarxistina civînê diyar kir, ew ê di vê civînê de pirsgirêkên civakî nîqaş bikin û bigînin Rêveberiya Xweseriya Demokratîk.
El-Dexîl, diyar kir ku ji ber kêmbûna avdanê, semad û bilindbûna nirxên wan li herêmê pirsgirêkên çandiniyê hene.
Serokê Buroya Partiya Muhafizkaran a Hesekê Muhab El-Hirês diyar kir ku civîn bi armanca nîqaşkirina pirsgirêkên civakî hate lidarxistin û anî ziman ku rûspiyên qebîleya El-Cibûr ên Dêrazor û Hesekê di civînê de amade bûn.
El-Herîs, diyar kir ku encamên civînê wê ji aliyên pêwedîdar re were ragihandin.
Serokeşîrê Ela-Rawî, Mihemed El-Rawî jî hêvî kir ku derfetên kar bêne peydakirin û daxwazên wan di ber çavan re bêne derbaskirin.
Di dawiya civînê de, Koordînatorê di navbera êlan û Rêveberiya Xweser Abdîn Bedirxan diyar kir ku ew ê daxwazên rûspiyan bighînin aliyên têkildar…*ANHA*

## Girîngiya avakirina kooperetîfan hate vegotin



Komîteya Aborî ya Kantona Qamişlo bi armanca nirxandina girîngiya avakirina kooperetîfan di pêşxistina rewşa aborî de bi cotkarên navçeya Til Hemîsê re civiya.
Komîteya Aborî ya Qamişlo bi cotkarên navçeya Til Hemîsê re civiya, giliyên cotkaran guhdar kir û girîngiya kooperetîfan ji wan re şîrove kir.
Tevî bi dehan cotkar û sewalkaran, endamên Komîteya Aborî yên Kantona Qamişlo Jiyan Hec Elî û Mihemed Silêman, endamê rêveber ê Kooperetîfan ê navçeya Til Hemîsê Hesen Şikrî û berdevkê fermî ya komîteyên aborî yê navçeya Til Hemîsê Hisên El-Ehmed, beşdarî civîna ku li Navenda Çandê ya navçeya Til Hemîsê hate li darxistin bûn.
Di civînê de komîteyê rexneyên cotkar û sewalkaran guhdar kir. Piraniya giliyên cotkaran têkildarî zuhabûna ku li herêmê pêk hatiye, rewşa jiyanî ya cotkaran, qutbûna kehrebeyê ya dem dirêj, peydakirina tovan bi rêbaza deyn û bi buhayên erzan û peydekirina mazotê bûn.
Cotkaran ji komîteyê xwestin ku carek din hilberîna pembû û mesrefa wan ên zêde jî di ber çavan re derbas bikin û buhaya pembû zêde bikin.
Jiyan Hec Elî endama komîteyê bersîva pirsên cotkaran da û wiha got: “Derfet gelek kêm in û divê gel rewşa Rêveberiya Xweser di vê demê de di ber çavan re derbas bikin.” Jiyan destnîşan kir ku komîteyê di du salan de tov weke deyn heta berhevkirina berhemê li cotkaran belav kir.
Di berdewamiya axaftina xwe de Jiyan pêwîstiya avakirina kooperetîfan ji bo pêşxistina aboriya wan anî ziman diyar kir ku komîte dê piştgiriya kooperetîfan bike û wê nîvê nirxê bide wan û wiha got: “Di civîna ku wê di serê meha Cotmehê de were lidarxistin, em ê hemû pêşniyar û daxwazên welatiyan nîqaş bikin.”
Di dawiya civînê de Endamê Rêveberiya Kooperetîfan ê Til Hemîsê Hesen Şikrî axivî. Hesen diyar kir ku divê cotkarên herêmê ne tenê ceh û genim divê gelek cure berheman biçînin û ev tişt anî ziman: “Gelek berhem hene, bi mesrefa kêm tên çandin û berhev kirin. Cotkar dikare bi rêya kooprertîfan biçînin û aboriya xwe û herêmê pêş bixin.”…
*ANF*

## Xebatên xizmetguzariyê li bajarê Dirbêsiyê



Bi armanca paqijkirina bajêr û xweşkbûna wê, ji ber ku paqijî pêşxistine şaristaniyê ye Bîroya Eykolojî ya di Şaredariya bajarê Dirbêsiyê de, ku bi armanca kar û barên xizmetguzariyê bi rengekî rêxistinî û lêz bê meşandin, her wiha parastina jîngeha û xweşikbûna bajêr bê kirin; rojana xebat li karmendan dabeş dike û wan li bajaran belav dike.

### PAQİJÎ PÊŞXİSTİNE


Bîroya Eykolojî ya di şaredariyê de gelek xebatên xizmetguzariyê daye wekî paqijkirina bajêre daye meşandin, wekî paqijkirina hersê riyên serke ji bajêr wekî (derbasbûna bajêr ji milê Qamişlo û Serê Kaniyê, her wiha hundirê bazara giştî ya bajarê Dirbêsiyê jî) Riya serek ya bajêr hate şûştin, di heman demê de jî darên hewîrdorên bajarê yên di navbera Dirbêsiyê û Serê Kaniyê de jî avdan. Ya herî girîng jî paqijiya derdore wekî avêtina çopê ye, ku bîroya Eykolojî giranî didin demên avêtina bermahiyan taybet di bazar û saziyan de. ***Ronahî Qamişlo***

## Gel xwest pirsgirêka kanalîzasyonê çareser bibe



Li Taxa Şehîd Xebatkar bîrên avê veguherîne xetên kanalîzasyonê. Welatiyê taxê ji ber nebûna av û toreyên kanalîzasyonê bîran dikolin. Bîrên av jê dernayê, weke kanalîzasyon bi kar tînin. Ev jî dibe sersebebê gelek nexweşiyan.
Ji ber ku taxa Xebatkar nû ye, pirsgirêkên av û kanalîzasyonê dijî. welatî ji ber vê sedemê bîran dikolin. Lê dema ku av dernayê dikin cihê ava kanalîzasyonê. Ev jî dihêle ku herdu avên vexwarin û kanalîzasyonê di bin erdê de tevlî hev bibin û nexweşiyên curbecur belav bibin.
Welatiyê taxê Mehmûd Mele got: “ji ber nebûna avê me bîr kolandin. Dema ku av derneket, me weke kanalîzasyon bi kar anî.” Mele ji şaredariyê xwest ku pirsgirêka nebûna avê û toreyên kanalîzasyonê I taxê çareser bike.
Hevserokê Şaredariya Kobanê Rewşen Ebdî di vê mijarê de got: “welatiyên taxê bê destûr ew bîr kirine kanalîzasyon. Şaredariyê di bingeh de, xeta kanalîzasoynê ji Botan Xerbî heya taxê dirêj dikir. Lê ji ber kêmderfetiyan proje rawestiye. Em hewl didin van demên pêş me de projeya xwe bibin serî…
*ANHA*

## RAMANÊ RÊBERTIYÊ



### Hevjiyana Azad -3-

**Abdulah Ocalan**

Danasîna giyanê mutleq (geist) a Hegel jî xwediyê maneyeke bi heman rengî ye. Li cem Hegel jî gerdûn bi giyana mutleq bi zanîn û serwextî li xwe vegeriyaye. Gerdûna dixwaze were naskirin û zanîn, vê yekê bi derbasbûna di qonaxên fizîkî, biyolojîk û civakî re, bi serwextbûna felsefî ya rewşa herî baş a serwextbûnê ye, ango bi giyana mutleq xwe dide naskirin û bi vê razî dibe û bi vî awayî weke gerdûna hatiye naskirin û zanîn serhatiya xwe temam dike. Ev hukmên em behsa wan dikin xwedî heqîqetên gelekî girîng in, û armanca jiyanê bi maneyê re wekhev dikin. Di felsefeya Yewnan de têgîna ‘theorîa’ jî xwedî maneyeke bi heman rengî ye. Weke encam ‘mane’ xwedabûna mirova/ê civakî ye. Li vir pirsa girîng ev e: Xwedabûna mirova/ê civakî yan jî hêza ‘maneyê’ ya bi dest dixe, ma dikare tevahiya maneya di gerdûnê de temsîl an jî îfade bike? Mirov dikare maneya herî zêde ya di civakbûnê de (giyana mutleq a Hegel) bi maneya gerdûnê bi xwe re wekhev bibîne? Ma civak bi xwe jî hebûneke bi kêmasî nîne? Hingê ma wê maneya wê jî kêm nebe?
Lê em bi rewşa xwe ya mirov nikarin bersiva tam a van pirsan bidin. Ji ber ku em bi civakê bi sînorkirî ne. Em nikarin bibin hebûneke jor-civakê. Em bi tenê dikarin pirsan bikin. Şensa me jî ew e, pirsîn jî nîviyê fêhmkirin û manedanê ye. Ango dikare nîşaneyan der barê fêhmkirin û manedanê de (maneya mutleq) bide. Em niha dikarin hukim bidin ku ji bo me gihiştina asta manedanê gelekî girîng e, û em kengî li xwe hayil dibin ku em gelekî nêzî armanca bingehîn a jiyanê ne, hingê em dikarin razî û têr bibin. Em dîsa dikarin hukim bidin ku ji me tê û em muqtedîr in, beşekî mezin ji pirsgirêkên bingehîn ên der barê jiyana manedar de ji hev derxin, bi kêmanî em dikarin bersivên der barê jiyana civakî ya rast, xweşik û adil de bibînin.
Em kengî bi vê perspketîfa felsefîk berê xwe bidin rastiya jinê, em ê bigihîjin wê encamê ku divê têkiliya jiyana manedar bi aliyên jinê yên xweşik, rast û baş bêne pêşxistin. Em bi vî hukmî rabin, nabe ku armanca bingehîn a bi jinê re zêdebûn û pirrbûn be. Ji ber ku zindiyên tekşane yên besît jî haya xwe ji zêdebûnê hene û belkî jî mirov dikare bibêje, jiyanên wan ên yekarmancî li ser vî bingehî hatine şîfrekirin. Lê gerdûn diberide. Beridîna bi pêş dikeve nîşan dide ku tekşane xwe dubeşî parçeyên wekhev dike û ev jî dawiya jiyanê nîne, berevajî bi vê çalakiya dabeşbûna mîlyaran carî ya tekşaneyê jiyan bi lez pirrcure û pirrcuda dibe. Em bi vê jî dizanin ku bersiva piştî wê ya manedar zêdebûn û pirrbûn nîne, guhertin û veguherîne. Ji bo jiyanê zêdebûn navgînek e ku pêdivî pê heye, lê ji bo mirov li jiyanê serwext bibe ti carî têrê nake. Zêdebûn navgîn e, armanc an jî manedar nîne. Ya rastî, jiyaneke maneya wê bi tenê zêdebûn û pirrrbûn be, jiyaneke gelekî kêm û bi qusûr e. Ma dibe ku rewş li cem tekşaneyê bi vî rengî be, lê belê jiyaneke mirovane bi jinê re bi tenê bi pirrbûn û zêdebûna cinsî ve girêdayî be, ev ne bi tenê kêmbûna maneyê di heman demê de korbûnê jî îfade dike. Li gorî ku bi jinê re mîna amîpan zêdebûn wê çênebe, nabe ku mirov pirrbûna bi jinê re bixe navend û hedefa jiyanê, naxwe ji beridîna mezin a zindiyan mane û dersa pêdivî pê heye nehatiye girtin. Jixwe bi teknolojiya roja me ya îro civaka mirov ji pirsgirêka zêdebûn û pirrbûnê bi temamî bihuriye. Pirsgirêka kêmbûnê ya cinsê mirov tineye, berevajî, her diçe mirov pirr zêde dibin û zêdebûna wan gihiştiye wê astê êdî di dinyayê de hilnayên. Ev pirrbûn û zêdebûn bi serê xwe dibe pirsgirêkeke gelekî mezin. Jixwe bi zindiyê tekşane jî piştrast bûye ku leza zêdebûnê bi asta paşvemayî ve têkildar e, û her zêdehiyek di heman demê de mirinek e. Pirrbûna fizîkî di tevahiya cureyên beridînê de xwedî maneyeke bi vî rengî ye. Hebûna bi mirin, yeqîn dike ku bi xwezêdekirinê wê karibe dewamî bijî, lê bi vê dixape. Xwe bi kopiyê xwe dewamkirin, dikare hewcedariya ewlebûnê û xwesteka tevlîbûna bêdawîbûnê razî û têr bike, lê jiyanê nake rastî û nake heqîqî.



# Ol xistin bin xizmeta desthilatiyê

**Hevberdevka Kongreya Îslama Demokratîk KÎD’ê Huda Kaya îslama desthilatdariyê nirxand û diyar kir bi sedsalane ol xistine bi xizmeta desthilatdariyê û li dijî gelan tê bikaranîn. Huda wiha got, “Divê qirkirina Kerbelayê baş bê tahlîlkirin û bûyera Kerbelayê tiştên îro tên jiyîn, nîşan dide.”**



Hevberdevka KÎD’ê Huda Kaya diyar kir ku bi sedsalane ol wek alava serdestiyê li ser gelan tê bikaranîn û wiha got: “Di oldariya Yezid de hiş hatiye tunekirin. Li ser serîtewandinek bê şert û merc kevneşopiyek ol hatiye avakirin, civakek nafikire derxistine holê.”
Kongreya Îslamî ya Demokratîk KÎD’ê yekem komxebata xwe li Enqereyê pêk anî. Di komxebatê de hat diyarkirin ku zîhniyeta serdest xwe li her qada civakê heyî dike û li ser vê nîqaş hatin meşandin. Hevberdevka KÎD’ê Huda Kaya li ser ‘Îslama desthilatdariyê’ nirxandin kir û got bi salane ol wek alava serdestiyê tê bikaranîn.
Hudayê got ev planek paşverû ya xwe dispêre sedsalan, heta hezar salan û wiha pê de çû: “Di seranserê dîroka mirovahiyê de ol wek hêmana serdestiyê li ser gelan hatiye bikaranîn. Ger em qirkirina Kerbelayê wek mînak bidin, Huseyînan, Zeyneban, hevalên Kerbelayê bi jinan re li dijî saltanata Emeviyan, li dijî oldariya Yezid seknek, berxwedanek, têkoşînek nîşan dane û divê em rastiya vê bizanin.”
Huda di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku divê qirkirina Kerbelayê baş bê tahlîlkirin û bûyera Kerbelayê tiştên îro tên jiyîn, nîşan dide. Huda destnîşan kir ku pêşî li mirovan hatiye girtin ku mirov nefikirin û lêpirsîn nekin û ev jî ji oldariya Yezid tê û got ev kevneşopî jî bi destê desthilatdariyan hatiye berdewam kirin. Huda wiha berdewam kir: “Di oldariya Yezid de hiş hatiye tunekirin. Li ser serîtewandinek bê şert û merc kevneşopiyek ol hatiye avakirin, civakek nafikire derxistine holê. Di vê kevneşopiya oldar ya heta îro hatiye gel tevî zilm, şaşî û neheqiyan li qadên bawerî, civakî, ahlaqî û aborî vê lêpirsîn nake.”
Huda Kaya destnîşan kir ku yek ji qadên ku desthilatdarî jê xwe xwedî dike ol e û tenê navê van desthilatdariyan guheriye, bi sedsalane bi heman zîhniyetê dixwazin civakê ji rastiya wan qût bikin û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Ev tenê li Anatolî, Mezopotamyayê pêk nayê. Li ku derê Musliman hebe serdestî pêkane. Êrîşên li hembrî jinan jî encama vê ferasetê ye. Zîhniyetên serdest li her qadê xwe heyî kirine.”…***JINNEWS***

## Divê hemû Êzidî vegerin ser axa xwe



Jinên Êzidî derbarê lîstikên hukûmeta Iraqê yên li dijî Şengalê de dan zanîn ku Şengal ne bê xwediye ew ê heta dawî li axa xwe xwedî derkevin û gotin: “Li dijî lîstikê hukûmeta Iraqê û dewletên dagirker em têkoşîna xwe didomînin. Ji bo ev lîstik vala derkeve pêdivî bi rêxistin û berxwedanek hevpar heye. Divê em li çand, huner, dîrok û li axa xwe xwedî derkevin.”
Piştî ku çeteyên DAÎŞ’ê di 3’ê Tebaxa 2014’an de êrîşî Şengalê kirin şûnde bi hezaran Êzidî hatin revandin, qetilkirin û koçberkirin.
Jinên Şengalê derbarê mijarê de anîn ziman ku hukûmeta Iraqê dixwaze demografiya Şengalê biguhere û got: “Ji bo Şengal bi hêviyek mezin bê xwedîkirin divê hemû Êzidî vegerin ser axa xwe û li dijî dagirkeran têbikoşin.”
Meyan Qasim da zanîn ku ti der wekî welatê mirovan ne şêrîn e û got: “Piştî ku çeteyên DAÎŞ’ê êrîşî me kir şûnde em çûn Çiyayê Şengalê û li wir 7 rojan man. Me di wê pêvajoyê de gelek zehmetî dîtin û xerîbî kişand. Piştre em derbasî Rojavayê Kurdistanê bûn. Li wir gelê Rojava gelek qîmet da me. Lê dîsa jî me doza Şengalê dikir. Loma em vegeriyan ser axa xwe. Em dixwazin hemû kes vegerin ser axa xwe û em li dijî lîstikên hikumeta Iraqê û dagirkeran têbikoşin. Lewra dema ku em bibin yek em ê bikaribin lîstikên neyaran vala derxin.”
Telê Hiseyîn jî wiha got: “Piştî fermanê em çûn Rojava piştî wê jî em çûn Başûrê Kurdistanê. Dema ku Şengal rizgar bû şûnde jî ez û zarokên xwe em dîsa vegeriyan Şengalê. Divê em Şengalê vala nehêlin da ku lîstikên Hukûmeta Iraqê yên li ser Şengalê vala derkeve.” Herî dawî Berfê Xelef jî diyar ku welatê mirovan ji hemû cihan xweştir e û wiha got: “Em ji hemû kesî re dibêjin ku vegerin ser axa xwe. Li dijî lîstikên hukûmeta Iraqê û dewletên dagirker em têkoşîna xwe didomînin. Ji bo ev lîstik vala derkeve pêdivî ji rêxistin û berxwedanek hevpar heye. Divê em li çand, huner, dîrok û li axa xwe xwedî derkevin. Ji bo Şengal bi hêviyek mezin bê xwedîkirin divê hemû Êzidî vegerin ser axa xwe û li dijî dagirkeran têbikoşin.”…
***JINNEWS***

## Nîqaşên ser projeya Zagonên Jin li Qamişlo hatekirin

Rêxistinên jinên Bakurê Sûriyeyê ser projeya zagonên jinên Bakurê Sûriyê, ku ji hêla Meclisa Dadweriya Jin hatibû amede kirin, da ku azdiya jin, parastina mafê wê û wekheviya herdu zayendan misgoger bikin, her wiha da ku civakek azad ser pirensîbên demokratîk û eykolojîk ava bikin li Qamişlo hate nîqaş kirin.
Bi armanca nîqaş kirina zagonên jinê civîn li Meclisa Dadweriya Jin a li Herêma Cizîrê bi beşdarbûna nûnerên saziyên jin ji ( meclisa dadweriya jin, Desteya Jin, Kongra Star, Komîteya lihevanînê, Heseroka Rêvebiriyê, Komeleya Mafê Mirova û Mala Jinê hate li darxistin. Ku di civînê de ser zagonên jin hatin nîqaş kirin, da ku li gorî rewş û pêwîstiyên demê bendên zagonê hewceyî guhertin hebê goftugu hatin kirin. Her wiha jinan pêşniyar kirin ku heman civîn li Herêmên ku nû hatine rizgarkirin ji ber ku ev nijar girêdayî hemû jinan e wekî li (Tebqa, Reqa, Kobanê û Girê Sipî jî bên li darxistin. Da ku di encama nîqaşê guhertinên bêne diyar kiri û wan biryar û guhertina ji bo danûstandinê û pejirandinê ji Meclisa Zagonsaz re werê pêşkşê kirin, dema bê erênîkirin ev ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê bê teyisandin. ***Ronahî/ Qamişlo***



## Jin li dijî Erdogan meşiyan



Jinên li Kolnê li dijî Serokkomarê Tirk Erdogan meşiyan û bertekên xwe anîn ziman. Nûnerên 8 saziyên jinan li bajarê Kolnê yê Almanyayê kom bûn û li dijî Erdogan meşiyan. Jin piştî meşê mîtîng lidar xistin. Di mîtîngê de MLPD, ZORA, Komondo Clara, Kouccourage, Meclîsa Jinan a Viyan a Kolnê heye, Cîhana bê Jiyîn, Yekîtiya Jinên Sosyalîst û ADHK’ê jî cih girtin. Nûnerên saziyan li ber îstasyona navendî ya trênê kom bûn û axaftin kirin. Nûnera Kucourage, diyar kir ku Erdogan ji bo çareseriya krîza aborî tê Almanyayê, dewleta Alman jî alîkariya bi Erdogan re kêm nake û wiha got: “Peywira me ew e ku em bi jinên kurd re bixebitin û rewşa Tirkiyê ji cîhanê re ragihînin. Ji bo azadiya jinê divê em bibin yek.”
Nûnerê Zora jî ani ziman ku li Tirkiyê, faşîzma Erdogan ken jî li jinan qedexe dike û wiha axivî: “Lê 8’ê Adarê bi hezaran jin li gel qedexeyê jî derketin kolanan. Çiqas zext û zordarî hebe jî jin têdikoşin û em jinên Alman li pişt wan in.”
Nûnera Clara jî wiha got: “Ên ku li Kurdistanê li dijî DAÎŞ’ê şer dikin li vir têne krîmînalîzekirin. Erdogan dijminê jina ye. Em li dijî wî ne. Em dîktatorê ku bi guleyên plastîk êrîşê dibe ser Dayikên Şemiyê, mêrên kujer diparêzerê li Almanyayê naxwazin.”
Nûnera MLPD’ê jî qedexeya li ser YPJ’ê rexne kir û got: “Erdogan çi kesê ku dengê xwe derdixe, bi tirsê, bi êrîşê û girtinê dixwaze bêdeng bike.”

## Jinên Reqayê dagirkerîya Tirk şermezar kirin



Meclisa Jinên Reqa û Gundewarên Wê bi daxuyaniyekê kiryarên artêşa Tirk a li dijî gelê Sûriyê de şermezar kirin.
Bi dehan jinên Reqa û gundewarên wê, endamên meclisên jinan li navenda Meclisa Jinên Sûriyê kom bûn û têkildarî kiryarên ku li dijî jinên Efrîn, Siwêda û Idlibê têne kirin, daxuyaniyek dan.
Daxuyanî ji aliyê Rêvebera Meclisa Jinan Xaliya El-Kecwan ve hate xwendin.
Di daxuyaniyê de ev tişt hate gotin: “Bi navê Meclisa Jinan li Reqa û Gundewarên Wê em piştgiriya gelê Efrîn, Idlib û Siwêdayê dikin. Em hemû planên li dijî gelê Sûriyê têne kirin ku dixwazin îradeya gelan têk bibin, şermezar dikin. Dewleta Tirk a dagirker dixwaze dagirkeriya xwe li ser xaka Sûriyê berfireh bike. Roj bi roj kiryarên wan ên hovane û ne exlaqî li dijî gelê me û bi taybet li dijî jinan dewam dike. Em bêdengiya rêxistinên mafên mirovan der barê hovîtiya dagirkeran li dijî gelê Sûriyê de şermezar dikin. Em piştgiriyê didin hemû gelên Sûriyê û ji mafê wan e ku çarenûsa xwe diyar bikin û parastina yekitiya ax û gelê Sûriyê bikin.
Baweriya me bi şervanên QSD`ê heye ku wê piştgiriya jinên Sûriyê bikin ku di şexsê şehîd Barîn û Sosin de hêza xwe ji hemû cîhanê re îsbat kir.
Em wek rêveberiya jinên Reqayê soz didin ku em ê kelemê çavê hemû kesan bin ku dixwazin xaka Sûriyê dagir bikin.”

# Partiyan li ser xebatên hevbeş lihevkirin

**Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê Şahoz Hesen diyar kir ku ew bi armanca nirxandina pêşketinên li herêmê, Sûriyê û Kurdistanê bi partiyên siyasî yên Kurd ên Rojava re civiyane. Hesen destnîşan kir ku hemû partî di civînên ku hatibûn lidarxistin de li ser girîngiya berdewamkirina xebata siyasî ya hevbeş li hev kirine**

Şahoz Hesen diyar kir ku ew bi armanca nirxandina pêşketinên li herêmê, Sûriyê û Kurdistanê bi partiyên siyasî yên Kurd ên Rojava re civiyane.
Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê Şahoz Hesen diyar kir ku ew bi partiyên ku berê di bin banê TEV-DEM'ê de bûn civiyane û rewşa dawî nirxandin.
Hevserokê PYD'ê Şahoz Hesen destnîşan kir ku hemû partî di civînên ku hatibûn lidarxistin de li ser girîngiya berdewamkirina xebata siyasî ya hevbeş li hev kirine û însîyatîfek avakirine.
Hesen diyar kir ku em bi partiyên Kurd ên beşdarî Rêveberiya Xweseriya Demokratîk bûne re civiyane.
Hesen wiha dewam kir: "Hemû partiyan dan xuyakirin ku li hember buyer û pêşketinên ku li herêmê diqewimin hewcedariya wan bi biryar, însîyatîf û hevbeşiya nêrînê heye.
Şahoz Hesen diyar kir ku hêjmara partiyên ji derveyî rêveberiya xweser hindik in û got, "ji bilî Partiyên Encûmena Niştîmanî ya Kurd deriyên wan ji hemûyan re vekiriye. Hesen wiha got: "Dikarin tev li însiyatifê bin lê divê helwesta xwe li dijî dagirkeriya dewleta Tirk ya li Efrînê zelal bikin. Endamên ENKS'ê gelek caran di êrîşên li ser Efrînê de cih girtine û ev yek jî rê li ber nerazîbûna gel û partiyên siyasî vekiriye û hatiye şermezar kirin."
Şahoz Hesen li ser armanca hevdîtinên wan bi partiyên din re wiha got: "Armanc me, avakirina çarçoveyeke siyasî ya kurdî a hevbeş e. Hemû partiyên kurdî yên Rojava ji bilî partiyê ENKS`ê beriya vê, însiyatîfa hevbeş ya `Nexşeya Rê` mohr kiribûn. Em dikarin sûd ji vê nexşeyê bigirin, em dikarin wê weke kevira bingehîn a têghiştina bi hev re bihesbînin."
Di dawiyê de hevserokê Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê Şahoz Hesen destnîşan kir ku tu astengî li pêş însiyatîfa wan derneketiye û got, "Dibe ku hin nêrînên partiyên siyasî yên cuda hebin lê ji bo berjewendiyên giştî yekîtî û piştgirî ferz e."



## Divê Kurd yekîtiya netewî ava bikin



Parlementerê HDP'ê yê Amedê Îmam Taşçier, destnîşan kir ku divê kurd ji bo parastina destkeftiyên xwe yekîtiya xwe ya netewî pêk bînin. Taşçier bang li hemû derdorên civaka kurd kir û got: "Yekîtiya netewî ne hatina gel hev a di bin sîwanekê de ye, tevgerîna hevpar a ji bo parastina destekftiyên kurda ye."
Parlementerê Partiya Demokratîk a Gelan HDP'ê yê Amedê Îmam Taşçier, bal kişand ser yekîtiya netewî ya kurdan. Taşçier, diyar kir ku kurd ji mêj ve ji bo yekîtiya netewî tev digerin û got: "Yekîtiya Netewî ji bo kurdan bivê nevê ye."
Taşçier, diyar kir ku lêgerîna di navbera kurdan de li gor konjukturê diguhere û ji bo pêkanîna yekîtiya netewî bênavber dixebitin. Taşçier got: "Eger li Kurdistana ku bûye çar perçe yekîtî pêk neyê, ne mimkun e ku di têkoşîna azadiyê de jî bi ser bikevin."
Taşçier, diyar kir ku armanca wan a sereke ew e ku li Kurdistana Bakur yekîtiya netewî pêk bînin û paşê li perçeyên din. Taşçier got: "Eger hûn li perçeyekî yekîtiya netewî pêk neynin, hûn nikarin li perçeyên din jî pêk bînin."

### YEKÎTÎ HEVPARÎ YE

Taşçier, destnîşan kir ku hêzên hegemonîk bi polîtîkayên xwe yên li ser kurdan pêkanîna yekîtiya netewî ya kurd asteng dikin û got: "Ev hêz mudaxeleyî yekîtiya netewî dikin. Pêkanîna diyalogê ya di navbera kurdan de asteng dikin." Taşçier, diyar kir ku divê li hemberî van polîtîkayan kurd bêtir diyaloga navbera xwe xurt bikin. Taşçier, bang li hemû derdorên civaka kurd kir û got: "Yekîtiya netewî ne hatina gel hev a di bin sîwanekê de ye, tevgerîna hevpar a ji bo parastina destekftiyên kurda ye. Li Tirkiyê kurd di bin zext û zoriyan de ne. Kesekî dibê ez kurd im bi girtinê re rû bi rû dimîne. Bilêvkirina peyva Kurdistanê jî qedexe ye. Ev destkeft, roj bi roj tên binpêkirin. Destekftiyên têkoşîneke sedsalî yeko yeko tên desteserkirin. Wekî salên 80'yî em bi qedexekirinan re rû bi rû ne. Li Tirkiyê 25 milyon kurd hene, lê hîn jî perwerdehiya bi zimanê zikmakî tune ye. Yekîtiya netewî li hemberî tunekirina destkeftiyan refleksek hevpar e."
Taşçier, destnîşan kir ku ji bo pêkanîna yekîtiya netewî ew diyaloogê bi derdorên kurd re datînin û got: "Berê diyalog tune bû. Niha bi diyalogan tên gel hev. Em bi kîjan partiyên siyasî û derdoran re hevdîtinê çêdikin, bal dikişînin ser girîngiya yekîtiya netewî. Ji bo vê jî ya dikeve ser milê me jî ew e ku yekîtiya netewî pêk bê." Taşçier, diyar kir ku ji bo pêkanîna yekîtiya netewî pêdiviya wan bi wextê heye û got: "Niha xebatên ji bo pêkanîna yekîtiya netewî baş dimeşin û hêviyê didin."

### DIVÊ GAVÊN HEVPAR BÊN AVÊTIN

Taşçier, anî ziman ku ji bo pêkanîna yekîtiya netewî wê di pêş de civînekê bi hemû dînamîkên kurdan re çêbikin û got: "Em ê li dor daxwazên gelê kurd bên cem hev û ji bo vê xebatên me hene. Kurd di pêvajoyeke hesas re derbas dibin. Ji bo em destkeftiyên xwe biparêzin divê hemû dînamîkên kurdan bi awayekî hevpar tev bigerin û gav bavêjin." Taşçier, diyar kir ku eger li hemû perçeyan yekîtî pêk bê, wê ev yek tesîrê li siyaseta wî welatî jî bike û got: "Divê dînamîkên kurdan û şexsiyetên kurd bên cem hevdu. Divê partî bên cem hevdu. Em naxwazin tu partî xwe betal bikin. Yekîtiya netewî ne hatina gel hev a di bin sîwanekê de ye, tevgerîna hevpar a ji bo parastina destekftiyên kurda ye. Armanca me ev e."…*MA*


## Biryara DMME'yê helwesta li dijî Kurdan e



Hevseroka Giştî ya HDP'ê Pervîn Buldan, li dijî biryara DMME'yê ku serlêdana Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan red kir, helwest nîşan da û diyar kir ev biryar nêzîkatiya Ewropayê ya li Kurdan nîşan dide.
Hevseroka Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) û her wiha Endama Şandeya Imraliyê Pervîn Buldan, ji bo ku Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) serlêdana êşkence ya 2008'an a li Imraliyê ya li ser Ocalan red kir helwest nîşan da.
Buldan got, ''Divê ev biryar ne tenê li dijî Rêzdar Ocalan divê helwesta li dijî hemû Kurdan were fêhmkirin. Li ser rêzdar Ocalan ne tenê ji 2015'an ve tecrîdeke teqez heye, ev 20 sal in tecrîdeke giran li ser heye.''
Buldan wiha got: ''Têkilî vê di serî de Tirkiye, welatên Ewropayê û DMME jî bi helwest û biryarên neyênî ne. Em dibêjin hevdîtina Rêzdar Ocalan a bi parêzer, malbat û şandeyên serbixwe re, mafekî însanî, siyasî û xwezayî ye. Em biryara redkirinê ya DMME'yê rast nabînin.''
Buldan got, ''Ocalan ne mirovekî jirêzê, ne girtiyekî jirêzê ye û Girtîgeha Imraliyê jî ne girtîgeheke jirêzê ye''.
Buldan herî dawî wiha got: ''Tecrîda ku bi salan e li vê girtîgehê tê kirin nayê qebûlkirin. Biryara îro ya DMME'yê piştgiriya li tecrîdê ye. Divê ev biryara DMME'yê bi rengê nêzîkatiya welatên Ewropayê ya li Kurdan were dîtin. Ez dixwazim bibêjim ku ev biryar ne rast e û demildest divê ev biryar were guhartin.''

## Bi tecrîdê dixwazin vîna gel bişkînin

Serokê Hevbendiya Niştîmaniya Demokratîk a Sûriyê Mehmûd Hemdek destnîşan kir ku biryara Dozgeriya dewleta Tirk bi armanca şikandina vîna gelê Kurd e.
Nerazîbûnên li dijî tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dewam dike. Dozgeriya Cezayan a Yekem a Bursayê di 16`ê Îlonê de cezayê 6 meh hevdîtina parêzeran bi Rêber Ocalan re qedexe kir.
Serokê Hevbendiya Niştîmaniya Demokratîk a Sûriyê yê Şehbayê Mehmûd Hemdek bal kişand ser biryara dozgeriye û diyar kir ku ev biryar ne adile.
Mehmûd Hemdek destnîşan kir ku dewleta Tirk ji ber tirsa xwe ji fikrên Ocalan ku azadiya hemû gelên Rojhilata Navîn armanc dike, tecrîdek giran li Ocalan ferz dike.
Hemdek destnîşan kir ku, dewleta Tirk bi van cezayan dixwaze Ocalan ji bûyer û pêşketinên ku li herêmê rû didin dûr bixine ye. Ev yek jî nîşan dide ku ji fikrên Ocalan ditirsin.
Hemdek diyar kir ku piştî Şoreşa Rojava bi milyonan welatiyên Bakurê Sûriyê li ser rêgeza Ocalan meşiyan e. Ji ber ku baş dizanîn fikrên Ocalan misogeriya azadiya wan e.
Hemdek wiha got: "Ferzkirina tecrîdê li ser Ocalan, binpêkirina aşitiyê û demokrasiya li herêmê ye û şikandina vîna gelan e."
Di dawiyê de Serokê Hevbendiya Niştîmaniya Demokratîk a Sûriyê yê Şehbayê Mehmûd Hemdek bang li rêxistinên mirovî û navdewletî kir ku ji bo ku Ocalan azad bibe bikevin nava tevgerê û bi erka xwe bi cih bînin…*ANHA*





# DMME dibe hevkarê êşkenceya li Îmraliyê

**Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê bi salane di mijara tecrîda li Îmraliyê de li derveyî hiqûqê tevdigere û dibe hevkarê sûcên dewleta Tirk. DMME a serlêdana Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan nirxand, ragihand têkildarî êşkenceya li ser Ocalan delîlên têrker nîne.**

Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê (DMME) a serlêdana Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan nirxand, ragihand têkildarî êşkenceya li ser Ocalan delîlên têrker nîne.
DMME'yê ragihand ku serlêdana lêkolînê ya Ocalan a piştî 8 salan a sala 2010'an hatî kirin red kir.
Dadgehê, rapora di derbarê 'êşkence nehatiye dîtin' a ji aliyê endamên Komîteya Pêşîlêgirtina Êşkenceyê ya Çileya sala 2010'an a li gel Ocalan hatibû amadekirin bibîr xist.
Tê payîn ku biryara dawî di nava rojê de bê parvekirin.
2'yê Adara 2010'an di serlêdana ji bo DMME'yê de bal hatibû kişandina binpêkirinê mafên mirov ên li gorî benda 2 a mafê jiyanê, dîsa benda 3 a qanûna êşkencê li xwe digire, benda 9 a mafê daraza adil, benda 13 a mafê serlêdana bi bandor û benda 14 a hiqûqa cihêkariyê li xwe digire ên li gorî Peymana Mafê Mirovan a Ewropayê.



Li Îmraliyê komplo giran dibe
Ji dema ku Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocalan bi komploya navdewletî rehîn hatî girtin û vir ve, dewleta Tirk çi dema ku li hemberî paradîgmaya Ocalan û siyasetê dixitime tecrîdê giran dike.

## Li Idlibê çeteyên Tirkiyê bi hev ketin



Li Idlibê di navbera çeteyên Heyet Tehrîr El-Şam û çeteyên Nureddîn Zengî de KU di bin nîrê Tirkiyê de ne, şer derket.
Li Idlibê di navbera Heyet Tehrîr El-Şam û koma çete Nureddîn Zengî de, ku girêdyî Tirkiyê ye şer derket. Jêderên herêmê dibêjin kome çete ya bi navê Nureddîn Zengî li navçeya Daret Îzze ya Idlibê 3 kes ji çeteyên Heyet Tehrîr El-Şam revandin û birin cihekî nediyar û ji ber wê şer derket.
Jêderên herêmê gotin piştî ku rageşiyê dest pê kir ji Efrînê gelek çete bi hawara Nureddîn Zengî ve çûne, îstîxbarata Tirk li Idlibê beşek ji gel li dijî Tehrîr El-Şam derxistine kuçeyan.
Ji ber vê bûyera li Daret Îzzeyê di navbera du komên çete de şer derket. Çeteyên El-Şamê ji 2 kes ji çeteyên Nureddîn Zengî kuştin.
Detpêka 2017'an dema hevdîtinên Astana de yên bi garantoriya Tirkiye, Rûsya û Îranê dest pê kirî, Heyet Tehrîr El-Şam (Cephet El Nusra), li dijî hevdîtinên Astana derket, ev rêxistin her wiha di lîsteya terorê ya DYA û Rûsyayê de ye. Cotmeha 2017'an artêşa Tirk ku propaganda kir û got, 'em operasyonê li Idlibê dikin' 8'ê Cotmehê li gel çeteyên Tahrîr El-Şam kete Idlibê. Piştî operasyona li Idlibê kete rojevê û di encama bazarên bi Rûsyayê re, 31'e Tebaxa 2018'an Tirkiyê jî Tehrîr El-Şam kire nav lîsteya terorê.
Tûgayên Nureddîn Zengî bi hinceta şerê di navbera wan de ji çeteyên Tehrîr El-Şam veqetiya, ku çeteyên Nureddîn Zengî di avakirina Tahrîr El-Şam de cih girtibû.
Koma Nureddîn Zengî ku niha bi temamî di bin nîrê dewleta Tirk de ye, di nav 'Eniya Rizgariya Netewî' de cih digire, ev 'Enî' ji 11 komên çete pêk tê û 1'ê Tebaxa 2018'an hate avakirin.
Van çeteyan peymana di navbera Erdogan û Putîn de ya 17'ê Îlonê li Soçî yê pêk hat nas kirin lê gotin ew ê çekan bernedin. Tehrîr El-Şam jî hê li ser vê mijarê daxuyanî nedaye.

## Erdogan û El Qaîde li hev rûniştin, çete vedikişin



Hate îdîakirin komên çete yên girêdayî dewleta Tirk wê ji herêma tampon ku Tirkye û Rûsyayê sînorê wê danîne vekişin. Hate ragihandin rejîma Erdogan û HTŞ ya têkilî El Qaîde li hev rûniştine.
Li gorî nûçeya Reutersê berpirsekî payebilind ê çeteyên bi desteka Enqerê ya ku jê re 'benda Sûriyê' tê gotin nûnerên Heyet Tahrîr el-Şam (HTŞ) ku el Nusraya berê ava kiribû, têkilî bi artêşa Tirk re danîn û bi çarçoweya peymanê wê ji herêmê vekişin.

### EL QAÎDE BI ENQERÊ RE TÊKILÎ DANIYE

Berpirsê çete ku navê xwe nedaye got, "Rewş baş dibe û Tehrîr El Şam, bêyî ku ji raya giştî re ragihîne got ew ê li gor peymanê tevbigere."
Peymana ku Enqere Nusra jî di nav de bi rengê berdevkê çeteyan li ser masê rûnişt, armanc dike heta 15'ê Cotmehê 'herêmeke ji leşkeran hatî valakirin' a bi kontrola Tirkiyê û Rûsyayê armanc dike. Ev herêm di navbeyna herêmên destê rejîmê û destê çeteyan de, wê bi berfirehiya 15-20 kîlometreyî be. Li vê herêmê ku çekên giran jî wê werin derxistin, tê gotin leşkerên Tirk û Rûs wê dewriye bigere.
Hebûna vê herêmê xwe dispêrê ser vekişîna komên çekdar. Heke çete li herêmê hebûna xwe bidomînin ev ê bibe binpêkirina peymanê.
Ev jî wê bibe hinceta operasyona rejîmê, ku bi mehan e haziriya xwe dike.
Heyet Tehrîr El Şam ku ji hêla Nusraya berê ve hatibû avakirin, li herêmê koalîsyona herî berfireh e ku serdestiya xwe daniye. Li gorî Mala Çavdêr a Mafê Mirovan 70 ji 100'î ya herêmên ku ji leşkeran hatin valakirin di kontrola HTŞ'ê de ye.




## Di emniyeta Alman de Sîxûrê MÎT'ê

Diyar bû ku polîsekî li Midûriyeta Emniyetê ya Berlînê dixebite ji MÎT'ê re dixebite. Tê gotin polîsê mijara gotinê dema ku agahî dida Sefareta Tirk li ser sûc hatiye girtin.
Beriya serdana Serokkomarê Tirk Recep Erdogan, rojnameya 'Der Tagesspîegel'ê ragihand li ser polîsekî ku di Midûriyeta Emniyetê ya Berlînê de, yê ku ji îstîxbarata Tirk re dixebitî lêpirsîn hatiye destpêkirin.
Hate gotin kesê ku behsa wî tê kirin yekî payebilind e û li Berlînê derbarê muxalîfên Erdogan agahiyan dide hev û van agahiyan dide Sefareta Tirk. Tê gotin tîmên lêpirsînê yên Elman ku polîsê nasnameya wî nehatî diyarkirin dişopandin, bûyera sîxûriyê bi belge kirin.
Lêpirsîna dozgeriya Berlînê veşartî tê hiştin, her wiha diyar bû, kesê ku polîsê sîxûr agahiyê jê re radigihand jî endamekî MÎT'ê ye, ku bi nasnameya dîplomatan digere. Piştî ku ev skandal derkete holê Wezareta Karê Navxwe ya Berlînê daxuyaniyek kurt da û got, ''Haya me ji îdîayên derbarê polîs heye''.
Wezîrê Karê Navxwe Andreas Geîsel têkilî lêpirsî bi berfirehî agahî neda, rayedarên Midûriyeta Emniyetê yên Berlînê ku ji kovara nûçeyan a 'Focus'ê re axivîn, gotin lêpirsîn didome. Balkêş e ku lêpirsîna ku ev demeke didomiya, beriya serdana Erdogan dane çapemeniyê.



## Serekçete Erdogan û dewleta Elman

Mihemed SEYDÎ

Şerê li dijî DAIŞ'ê didome û rojane dever têne rizgarkirin, herêm ji terorê tê paqijkirin û sivîl tên rizgarkirin. Ji kobanê heta Minbic,Tebqa, Reqa û niha jî li Dêrezorê şerê li dijî van çetan bi pêşengiya Ciwan û hêzên kurd tê kirin.
Li gelek welatên Ewropa ji ber şerê li dijî DAIŞ'ê ku şervanên YPG û YPJ'ê li kobanê da destpêkirin ew bi heyecanekî mezin ji aliyê hemû civakên cihanê ve hatin destekkirin.
DAIŞ'a ku hemû welatên Ewropa ji terora wê ditirsin û ji bihistina navê wê diketin nava xofê îro li hemberî vê terorê û ji bo dawî li wan were çi destekê didin şervanên kurd.?
Ji destek dayîna Ewrûpa ji bo hêzên ku li dijî DAIŞ'ê şer dikin zêdetir em bala xwe didinê ku belgeyên têkiliya gelek dewletan a çawa bi DAIŞ'ê re dibin desteke derdikevin..
Ji xwe rojane çeteyên biyanî yên ji gelek welatên Ewrûpa yên cûda ku ji aliyê QSD'ê ve tên dîlgirtin jî rastiyeke ku heye derdixe ber çavan. Çiqas ku ev dewlet bibêjin ew hemwelatiyên wan bê agahî û ji derveyî îradeya wan tevlî DAIŞ'ê bûn nayê bawerkirin û wê neyê bawerkirin.
Beriya çend rojan belgeyeke ku ji aliyê telefizyoneke fermî ya Almanî ZDF'ê ve hatiye weşandin, behsa yek ji sîxurên Istixbarata Almaniya dikir ku çawa zarokekî 16 salî tevlî nava DAIŞ'ê kiriye û ji bo wî bilêta balafirê qutkiriye û pere jêre peydakirine ji bo ku tevlî DAIŞ'ê bibe.
Ger ku ev hinceta wan heye çima li hemberî vê tedbîr nayên girtin.
Ji tedbîran wêdetir yên ku DAIŞ xwedî kir û heta niha bi sedan belgeyên têkiliya wan û DAIŞ'ê derketin û li wir bi dehan baregehên perwerdekirin û rêxsitinkirina DAIŞ'ê hebûn yanî dewleta Tirk a ku niha jî yekser nûnertiya bermahiyên DAIŞ, cibhet El-nusra û hwd komên çete yên li Idlibê dike çima peywendiyên xwe pêre wekî welatekî yasayî dewam dikin.
Bi taybet ya ku herî zêde peywendiyên xwe bi dewleta Tirk ya ku nûnertiya çeteyan dike û Erdogan bi serçetetiya vê rêjîma faşist û DAIŞ'ê dike didomînin.…
Îro Erdogan li Almaniya tê pêşwazîkirin. Civaka Alman, kurdistaniyên li wir û hin parlementer û endamên partiyên çep û demokrat li hemberî vê serdanê derdikevin û qebûl nakin ku Dîktetorekî bi vî rengî li welatê wan were pêşwazîkirin. Kampaniya "hey Erdogan tu ne bixêr hatî" tê lidarxistin.
Li vir pirs ew e, hikumeta Alman çiqasî li dijî DAIŞ'ê ye, ger li dijî DAIŞ'ê ye çima serkêşê wê Erdogan bi vî rengî pêşwazî dike. Ger ku ji tirsa serê xwe ya ku AKP'ê pêla koçberiyê û çeteyan ber bi wê ve bişîne serekçete Erdogan pêşwazî dike çima çekan difroşe Dewleta Tirk û dizane ku bi van çekan gelê kurd yên ku DAIŞ têk bir tê kuştin.
Bi van çekan niha dewleta Tirk komên çete ku xeteriya wan li ser hemû cîhanê heye diparêze wan hîne mezin dike..
Ji bo vê yên ku dixwazin DAIŞ û komên din ên çete tune bikin dive çavkaniya wê biruxînin. Ne ku wan bi merasîmên leşkerî pêşwazî bikin û li hundir qesran bi wan re peymanan çêbikin.
Îro xwanrêj û serekçete Erdogan li Almaniya tê pêşwazîkirin. Û her wiha li Rûsiya jî lihevkirin pêre tên kirin.